rupel 1++_Layout 1 9.09.2022 19:19 Page 1



## Ev ne kîsek e

Du hefte berê dîmenek û çend wêne li ber deriyê Edliyeya Amedê di ajans û platformên medya dijîtal de hat parvekirin. Di van dîmenên ku Ajansa Mezopotamyayê belav kirin de mirovekî derdora 65 salî û di destan de jî kîsekî spî... ***Hisên Çatikkaş / R.8***



## Êrîşên li dijî jinan

Ev çend roj in nûçeyên li Tirkiyê û Kurdistanê bi mijarên binçavkirin, hepskirin û berdanên jinan ve mijûl in. Êrîşên sîstematîk ên li ser jinan ku hem ji hêla dewleta baviksalar, nijadperest û faşîst... ***Munewer Azîzoglu Bazan / R.2***



## Rexneya wêjeyî

Rexneya wêjeyî berî her tiştî parvekirina xwendinan e. Mirov piştî xwendina berhemeke wêjeyî helwêst û ramanên xwe li ser wê berhemê rave dike û mirov nirxandina fenomenên nava wê berhemê dike... ***Îbrahîm Seydo Aydogan / R.5***


# xwebûn

12 - 18 ÎLON 2022 HEJMAR: 143 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


# Hêl hêla Cûdî ye

## Di 17'ê îlonê de bi tevlîbûna saziyên sivîl û partiyên siyasî dê bi dirûşmeya Li dijî Talan û Hilweşandina Şer ji gelek bajarên Tirkiye û Kurdistanê dê gel li dijî talan, qirkirin û dagirkirinê berê xwe bide Cûdî. Her wiha gelek sazî û dezgehên ekolojiyê jî banga tevlîbûnê kirin

Xwezaya Kurdistanê ji salên 90'î ve ye tê talankirin. Piştî şerê yekemîn ê cîhanê dewleta osmaniyan belav bû û komara Tirkiyeyê li ser hilweşindina osmaniyan ava bû. Gelê kurd, tirk û gelên din ev komar bi hev re ava kirin. Heta komar ava bûyî jî behsa biratî û wekheviyê dihat kirin. Lê piştre polîtîkayên netew-dewletê ketin dewrê û kesên ku komar avakirin fikra ku "Tirkiye ya tirkan e" bi pêş xistin. Tunekirin, kolekirin û îmhakirina gelê kurd êdî bûbûn polîtîkayên sereke yên dewletê. Her wiha ji ber van sedema gelek gelên din nekarîn hebûna xwe biparêzin û di nava polîtîkaya homojenkirinê de heliyan... ***Hevpeyvîna Abdullah Îdîg / R.4***

Li dijî talana xwezaya Kurdistanê wê tevgerên ekolojiyê û partiyên siyasî di 17'ê îlonê de bi pêşengiya gel ber bi Çiyayê Cûdî ve meşeke girseyî li dar bixin. KCD, DBP, HDP, TJA û Tevgera Ekolojiyê ya Mezopotamyayê, di 5'ê îlonê de der barê meşa ku wê bê lidarxistin li Amedê civîneke çapameniyê li dar xistin û bi daxuyaniyeke hevpar banga meşê kirin. Bi pêşengiya Tevgera Ekolojiyê ya Mezopotamyayê daxuyaniya çapemeniyê hatibû xwendin û di daxuyaniyê de hat gotin ku bi talankirin, wêrankirin, dagirkirin, qirkirin û bi rêbazên cuda talana xwezaya Kurdistanê derketiye asteke din û ji bo meşa ku li dar bixin jî banga tevlîbûnê kirin... ***R.7***



## Malbata Guler

Ji malbata Guler ya ji Pasûrê Abdulsamet Guler ku di sala 1990'î de tev li PKK'ê dibe di sala 1996'an de şehîd dibe. Esat Guler ku ew jî piştî kekê xwe Abdulsamet tev li PKK'ê dibe di sala 2007'an de li Çiyayê Kato şehîd dibe. Bavê wan Îlhamî Guler jî piştî tevlîbûna herdu kurên xwe ya PKK'ê di sala 2006'an de krîza dil derbas dike û jiyana xwe ji dest dide. Piştî şehadeta herdu birayên xwe û mirina bavê xwe Serhat Etman Guler jî bi pençeşêrê dikeve û di sala 2009'an de jiyana xwe ji dest dide. Herî dawî jî dayika Guler Nûriye Guler ku piştî tevlîbûna kurê xwe Esat a PKK'ê bi nexweşiya felcê dikeve û... ***R.3***

## Merdeyan de şer kenê

Dewleta tirke sey caardişê şerê taybetî îşkenceyê vera cenazayan rê dewam kena û cenazayanê gerîlayan nêdana keyeyanê înan. Wexto ke dana zî bi hawayêkê bêhurmetî teslîmê înan kena. Çend cenazayê gerîlayan bi hawayêkê bêhurmetî pê kargo û postayan keyeyanê ci rê ameyî şirawitiş. Cenazaya gerîlayê HPGyî Egîd Îpek o ke 23ê gulana 2017î de şehîd bîbî û cenazaya Mahsum Aslan o ke 2ê tebaxa 2021î de şehîd bîbî pê kargoyî erşawîyaybî keyeyanê înan. Gerîlayê HPGyî Mahsum Aslan menga hezîrana 2018î de Koyê Sûrî yê Dêrsimî de hêrişê hewayî yê artêşa tirke de şehîd kewtbî.... ***R.9***

## HDP'ê dikin hedefa xwe

Li Tirkiyeyê bi nêzbûna pêvajoya hilbijartinê re nîqaşên di navbera partiyan de jî dijwar dibin. Tevî ku HDP'ê xeta xwe ya siyasî diyar kiriye û biryar daye ku bi "Tifaqa Ked û Azadiyê" tev li hilbijartinan bibe jî di nav heftê de di navbera CHP û ÎYÎ Partiyê de li ser HDP'ê nîqaşên dijwar derketin. Parlamenterê CHP'ê yê Stenbolê Gursel Tekîn di weşana zindî ya televîzyoneke tirkî de meşrûbûna HDP'ê ya di siyaseta Tirkiyeyê de bi bîr xist û got ku dibe wezîran bidin HDP'ê. Lê ÎYÎ Partî ku ji partiya faşîst a tirk MHP'ê veqetiyaye û bi CHP'ê re "Tifaqa Millet"ava kiriye bi awayekî tund li dijî vê daxuyaniyê derket... ***R.7***

GULÇÎN ADAR

Qîrayîşê ciniyan dinya lerzneno! **R.9**

RAMAZAN OLÇEN

Dostaniya bi dagirkeran re **R.6**

FATMA TAŞLI TUNÇ

Nanê tenûrê **R.10**

# Pêşiyê li çareseriyê digirin

Hevseroka OHD'ê Îlknûr Alcan, diyar kir ku Tirkiye dixwaze bi tecrîdê têkiliyên Abdullah Ocalan ên bi civakê re qût bike û wiha got: "Weke tê zanîn li vî welatî pêvajoyek çareseriyê pêk hatibû. Abdullah Ocalan jî di vê pêvajoyê de bi aktîf rol girtibû ser xwe. Ji ber wê jî dixwazin bi vê tecrîdê pêşiya çareseriyê û aştiyê bigirin. Heta doh bi birêz Abdullah Ocalan re muzakere dikirin lê îro tu lê dinêrî ji bo Abdullah Ocalan hemû qanûnan bin pê dikin. Heke Tirkiye van biryaran bi cih neyne wê Konseya Ewropayê li Tirkiyeyê danekirinan pêk bîne. Der barê vê mijarê de îhtimal heye ku pêvajoyekê bide destpêkirin. Heta dibe ku Konseya Ewropayê Tirkiyeyê bi temamî ji derveyî xwe bihêle. Heke Tirkiye gavên şênber neavêje heta civîneke din mafê me heye ku em agahiyê bidin Konseya Ewropayê." ***R.6***



rupel 12++_Layout 1 9.09.2022 15:40 Page 1

xwebûn

12- 18 Îlon 2022 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 143

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Kadri Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco, Munewer Azîzoglu Bazan
**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Fırat Mahallesi 499/1. SK 100 Evler Sitesi No: 6F **Kayapınar/ Diyarbakır**
**Baskı:** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
**Tel:** 0 (541) 806 84 85

# Amed ra portreyêk: Pîrînççîzade Feyzî Beg



Dr. Îsmet Konak



Bakurê Kurdistanî de baş yan xirab xeylê portreyê balkêşî ciwîyayî. Tayênan awa îşxalkeran de ajne kerd, tayênan zî vera kolonyalkerdoxan têkoşîn kerd. Înanê ke wayîrê nasname û têkoşînê xo nêvejîyaybî ra portreyêk Pîrînççîzade Feyzî Beg bî. Feyzî Beg serra 1878î de Amed de ameybî dinya. Babîyê ci Pîrînççîzade Arîf Efendî Amed de merdimo zaf şinasnaye bî. Ey Amed de hem şaredarîye hem zî parlamenterîye kerde.

Arîf Efendî heman wextî de xalê Zîya Gokalpî bî. Înan her tim yewbînan rê paştî dabî. Tayê çimeyan de derheqê têkilîyêka înan de yew anekdot yeno vatene. Serra 1894î de lîseya (îdadî) Amedî de serebûtêk qewimîya. No dem wendegehan de wendekaran her tim “padîşahê mi ti zaf biciwî” vatêne. Rojêke wendekaran “şarê mi ti zaf biciwî” vat. Goreyê texmînan Zîya Gokalpî serkêşîya înan kerdo. Seba ke Gokalp birazayê Pîrînççîzade Arîfî bî, no serebût cuya Arîf Efendîyî ser o xeylê tesîrdar bî.

Cuya Pîrînççîzade Arîf Efendîyî de çîyêko ke bale anjeno Qirkerdişê Armenîyan o. Tayê çimeyan da yeno zanayene ke Arîf Efendî serra 1896î de Amed de tewrê Qirkerdişê Armenîyan bîyo.

Arîf Efendî serra 1908î de Meşrutîyetê II. ra tepîya sey parlamenterî ame weçînitene. La parlamenterîya ey zêde dewam nêkerd. 14ê adara 1909î de şî heqîya xo. Mergê ey ra dima lajê ey Pîrînççîzade Feyzî Begî “arz-i endam” kerd. Feyzî Beg zî sey babîyê xo tewrê polîtîka bî û Amed de Partîya Yewîye û Averşîyayîşî (bi tirkî İttihat ve Terakki Partisi [İTP]) ra parlamenter bî. Ey 4 parlamentoyanê Împaratorîya Osmanî de ca girewtbî.

Ma tewr zaf wextê Qirkerdiş yan Jenosîdê Armenîyan da raştê nameyê Pîrînççîzade Feyzî Begî yenê. Amed de serra 1915î de aşma adare ra tepîya amadekarîya jenosîdî dest pêkerdbî. Çarçewa planî de Dr. Reşît Beg sey walîyî ame tayînkerdene. Birastî Reşît Beg key ke walîyê Musulî bî, Wezîrê Karanê Zerreyî yê Împaratorîya Osmanî Talat Paşayî rê tayê telgrafî rusnaybî û ci rê vatbî ke o do vera armenîyan raya tewr kilme bîyaro ca. Bixo “doktor” bî û armenîyî sey “mîkrobê zîyankarî” vînayêne. Reşît Begî bi cerga Çerkes Harunî 28ê adara 1915î de ameyî Amed, Pîrînççîzade Feyzî Beg vera ci şî. Derheqê têkilîya Pîrînççîzade Feyzî Begî tarîxnasê tirkî Ayhan Aktarî çend serrî verî rojnameyê Agosî rê meqaleyêke nuştbî. Ma na meqale ra xeylê zanayîşan gênê.



Dr. Reşît Beg badê ke ame Amed, tîya de “heyetê tahkîkî” rona. Mîyanê nê heyetî de Pîrînççîzade Feyzî Beg zî estbî. Goreyê fermanê Talat Paşayî heyetî dest pê tesbîtkerdişê merdimanê ke leşkerî ra remayî û çekanê ke taxa armenîyan de nimite bîyî kerd. Talat Paşayî qaymeqam û walîyan rê nuştbî ke mabênê armenîyan de îxtîmalê xoverdayîşî esto. Bi fermanê heyetê tahkîkî xeylê armenîyî tepişîyayî û zîndan de kişîyayî.

Goreyê texmînan serra 1914î de Amed de nêzdîyê 56 hezarî armenîyî ciwîyayêne. Walî Dr. Reşît Begî bado qayît kerd ke zîndan de seba tepişteyanê armenîyan ca nêmaneno û vernîya têgêrayîşê armenîyan nêgêno, gulane 1915 de Talat Paşayî rê telgrafêk nuşt û waşt ke armenîyan surgun (osmankî de: tağrib û teb’it) bikero Musul û Botan. Tîya de reyna nameyê Pîrînççîzade Feyzî Begî yeno vînayene. O heta Botanî şî, dewan û bajaran de vera armenîyan propagandaya qilêrine kerde. Ey kurdan rê vat ke qaydeyanê îslamîyetî bîyarê ca, armenîyan pêro qir bikerê û teyna têkilê kênekanê ciwanan mebê. Çike çimê Feyzî Begî de kênekanê ciwananê “gâvuran” de zewicîyayîş “caîz” bî.

Pîrînççîzade Feyzî Beg key ke agêra, hetê Hasankeyfî de kinarê çemê Dîcleyî de dewa Şîkefta de vindert. Uca de eşîra Ramanî zîyaret kerd. Serkêşa eşîre Perîhan Xanime de pêvînayîş kerd. Yew lajê Perîhane Emînî mîyanê artêşa Kazim Karabekîrî de wezîfe girewtêne. Di domanê aye yê bînî Omer û Mustafa dewe de ciwîyayêne. Înan ser o tayê sûcî estbî. Rixmo ke Feyzî Begî rewşe zanayêne, nê domanî xo de ardî Amed. Seba Qirkerdişê Armenîyan hetkarîya nê di merdiman lazim bîye. Înan walî Reşît Begî reyde pêvînayîş kerd. Walîyî ci rê vat ke “armenîyan bi kelekan serê çemê Dîcleyî de berê teberê bajarî û bikişê. Zerd û mucewheranê înan bîgêrê. Nêmê înan mi rê bîyarê. Ma do înan bidê hîlal-î ahmerî.” Birastî Reşît Begî xeylê zerdê armenîyan seba xo abirnayî.

Pîrînççîzade Feyzî Begî seba nefîkerdişê armenîyan tayê lîsteyî amade kerdî. Goreyê nê lîsteyan bi hezaran armenîyî hetê Mustafa û Omerî ra ameyî qirkerdene. Dr. Reşît Begî zanayêne ke heme înan sûcêk ard ca. Ey şik kerdêne ke Mustafa û Omer nê sûcî heta peynîye nêniminê. O zî kerdoxê nê sûcî bî û kiştox bî. Seba nimitişê sûcî bi fermanê Reşît Begî Mustafa û Omer dewa Tîlalo ya Amedî de bi destê cerga Çerkes Harunî ameyî kiştene.

Netîceya Şerê Dinya yê Yewinî de Dewleta Osmanî lete bîye. Derheqê Jenosîdê Armenîyan de muhakemekerdişî dest pê kerd. Pîrînççîzade Feyzî Beg zî ame muhakemekerdene û çeleyê 1919î de ame nefîkerdene Girawa Malta. Tîya de 2 serrî mend û serra 1921î de Malta ra agêra.

Key ke Anqara de hukmato newe ame awankerdene, çarenuştişê Pîrînççîzade Feyzî Begî zî vurîya. Xora têgêrayîşo kemalîst wayîrê kerdoxanê şîdetê vera armenîyan bî. Yanî kemalîstî derheqê Qirkerdişê Armenîyan de wayîrê polîtîkaya ÎTPyî vejîyaybî. Nê konteksî de zaf nimûneyî estê. Ma vajê qaymeqamê qezaya Bogazliyanî ya sancaqê Yozgatî Kemal Beg ame sey “şehîdê neteweyî” qebulkerdene. Keyeyê ey rê milko ke armenîyan ra mend dîya.

Feyzî Begî destpêkê awanbîyayîşê Komara Tirkîya de 3 termînî wezîrîya awanîye kerde. Nê prosesî de nameyê ey baxusus wextê Konferansê Aştîye yê Lozanî de ame rojeve. Konferanso ke mabênê 11ê teşrîna peyêne ya 1922î û 24ê temmuza 1923î de qewimîya seba ameyoxê Tirkîya û tebîî şaran zaf girîng bî. Seba konferansî Tirkîya ra zî delegasyonêk ame dîyarkerdene. Wezîrê Karanê Teberî yê Tirkîya Îsmet Inonu serekê delegasyonî bî. Delegasyon de Amed ra di merdimî estbî. Parlamenter Zulfu Tîgrel û Wezîrê Awanîye Pîrînççîzade Feyzî Beg sey hetkaran tewrê delegasyonî bîbî. Peynîya konferansî de seba kurdan “ubudîyet” vejîyaybî. Rejîmê kemalîstî kurdan rê dafikêke amadekerdbî û parlamenteranê kurdan ginayî na dafike ro. Tayê vejîyayî parlamento û uca de kincê herêmî girewtî pira. Nê konteksî de bitaybetî nameyê Hasan Heyrî Begî zaf yeno nuştene. Tewirê Zulfu Tîgrelî û Pîrînççîzade Feyzî Begî zî zaf yenê rexnekerdene. Çike înan derheqê kurdan de Lozan de qet çîyêk nêkerd. Tewr zîyade Amed ra sîyasetmedar û doktor Mehmet Şukru Sekbanî vera Lozanî nêrazîbîyayîşê xo mojnabî. Serra 1923î de mektubêka bi sernameyî “Kurdî tirkan ra çi wazenê?” nuştbî. Na mektube pê Pîrînççîzade Feyzî Begî hukmatê tirkî rê şawite. Sekbanîyo ke qanûnê bingeyî yê 1921î ra tayê maddeyî şuxilnayî hukmat pêhesna.



Pîrînççîzade Feyzî Begî bado demê xoverdayîşê Şêx Seîdî de zî rolê xo yê îtaetkarî kay kerd. Key ke xoverdayîşî serra 1925î de dest pê kerd, Ahmet Mîthat Kalabalik walîyê Amedî bî. Yeno fikrîyayene ke mabênê Feyzî Begî û Kalabalikî de “têkilîye” estbî. Yanî Feyzî Begî seba pankerdişê xoverdayîşî dezgehanê dewlete rê hetkarîye daye. Nuştoxe Ayşe Gunaysu nê konteksî de nuşteyê xo yê bi sernameyê “Qirkerdoxanê dewlemendanê Dîyarbekîrî ra keyeyêk: Pîrînççîzadeyî” de dîyar kena ke Feyzî Beg kerdoxo yewin ê qetlîyaman û nefîkerdişan bî. Nê semedî ra Feyzî Begî serra 1927î de “nîşanê xoserîye” girewtbî.

Feyzî Beg serra 1933î de merd. Keyeyê ey ra merdimo tewr namdar bêguman Cahît Sitki Taranci bî. Taranci lajê Bekir Sitki yo. Vanê ke Bekir Sitki sayeyê milkanê ke armenîyan caverdê dewlemend bîyo. Bikilmî keyeyê Pîrînççîzadeyan hem konkestê Jenosîdê Armenîyan hem zî persa kurde de tarîx de zaf xeletîyê girdî kerdî.